EM NIKARIN
BISEKININ
di rêya Swêdê dike baştirîn welatê
cîhanê ku mirov tê de bijî

WELATÊ DERFETAN EM BI HEV RE AVA DIKIN

Em dixwazin welatê Swêdê bibe welatê derfetan û bêyî ku mirov li paşxanê xelkê binêre, her kes bikaribe ji xwe re pêşve here û para xwe ya berpirsiyariya di nav civatê de werbigire. Ev yek Swêdê bi hêztir dike. Lê belê îroj tiştekî din li pêş çav e. Piraniya xelkê, rastî deriyê girtî tên. Pileya bêkariyê di asteke pir bi xeter de ye – bi taybetî jî di nav ciwanan de. Personel di civata têrûtijî de ji kar têne derxistin. Li heman demê jî, fîrma rastî dijwariyên peydakirina kompetensa rastîn tên. Gelo divê kî cirma vê bide gava ku li her rewşî bac bête daxistin?

Mirov dikare berê xwe bide aliyekî din, ku pir kes bikaribin bibin xwedî jiyaneke dewlemend. Ev yek hewildanên bi armancên diyar divên. Gelek cihên din yên perwerdeyê, gelek cihên din yên ji bo avakirina xaniyan, komekî ji bo fîrmayên ku derfetên kar didin ciwanên bêkar, gelek hesinrêyên din yên ji bo leztrênan. Gava kar bêhtir bibe ev tête maneya aboriyeke baştir. Wê gavê em ê bikanibin kar bidin gelek kesan û kalîteya xwendegeh û sexbêriya nexweşan bilindtir bikin – û bêhtirbûna qelîşteka di navbera mirovan de kêmtir bikin. Bi vê yekê re, karên nû dihêne peyda kirin û aborî bi hêz dibe û ber bi pêşve diçe. Karê aqilane ew e ku mirov pirsgirêkan bi hev re çareser bike, ne ku ciwanan li hember kesên bi'emir, nexweşan li hember saxleman, mêran li hember jinan û bêkaran jî li hember kardaran rake. Welatê Swêdê ji kêmbûna qelîştekan û bêhtirbûna wekheviyê qezencê dike.

Tu dê roja 19ê îlonê hilbijêrî. Gelo divê Swêd bibe welatekî firsendên ji bo kar yên pirtir, tevî têrûtijîbûnê ji tevaya welatiyan re û xwedî baweriya ji pêşerojê re – yan divê em hê çar salên din jî li bêhtirbûna van qelîştekan temaşe bikin?

Em xwedî wê baweriyê ne, ku gava gelek kes bibin kardar bin û bikaribin xewnên xwe rast begerînin, dê hingê welatê Swêdê bêtir xurttir bibe.

Ma te divê tu bi me re bî?

Mona Sahlin

EM JI BER BERPIRSIYARYÊN XWE YÊN JI BO SWÊDÊ NIKANRIN BISEKININ

Gelo Swêd ketiye ser riyeke şaş? Bi pileya herî bilind ya bêkariya ciwanan ya li Ewropayê, em nikarin di pêşerojê de serkeftî bin. Ev siyaseteke bêberpirsiyarî ya aboriyê ye. Me budçeya sala 2006an bi serzêdeyiyeke 70 milyar kronî dewr kir. Hikûmet hema di nav çend salan de ev zivirand ser jêkêmiyeke zêde.

Bac, piranî ji bo kesên xwedî hatineke bilind ya salane, bi pereyên deynkirî hat daxistin. Li hember vê jî, sermayerazandina ji bo kar, perwerdeyê û civata têrûtijî çênebû. Encama vê kirinê, wek pileya bilind a bêkariyê, wek li xwendegehan kêmbûna mamosteyan û wek dirêjbûna dorê li nexweşxaneyan, li ber çavan e.

Me berê welatê Swêdê ji aloziyên aborî rizgar kiribû. Loma em dizanin siyaseteke xwedî berpirsiyarî, bêkariyê ji holê radike. Yê ku aboriya Swêdê mezin dike, kar bi xwe ye. Loma em dixwazin baca li ser fîrmayên biçûk kêm bikin û sermayeyê li ser nûyîtî, lêkolîn û pêşketinê razînin.

Û her wisa jî, em dixwazin li ser perwerdeya ku kar diafirîne sermayeya xwe razînin. Em pêşniyara liserhev 100 000 karên nûdestvehatî dikin. Wek cihên pratîk û perwerdeyê. Em dizanin gava ku mirov bibin xwedî derfet, hingê kar jî pir dibe. Hingê sermaye bi me re dimîne, ku em kalîteya xwendegehan, sexbêriya nexweşan û guhpêdanê bilind bikin. Siyaseteke bi berpirsiyarî ya aboriyê, pêşiya mazinbûnê vedike û di civatê de xwedî li têrûtijîbûnê û dadimendiyê derdikeve.

- Siyaseteke bi berpirsiyarî ya aboriyê.
- Berî her tiştî kar.
- Xwendegeh, sexbêriya nexweşan û guhpêdan berî daxistina bacê tên.

JI CIWANAN RE BÊHTIR KAR

Pileya bêkariya ciwanan ya li Swêdê, pileya herî bilind a Ewropayê ye. Lê dîsan jî, berî ku pratîkekê yan perwerdeyekê bidin ciwanan, li Daîreya Karî, wan bi kêmanî çend sê mehekê didin rawestandin. Gelek caran ev dirêjtir jî diajo. Qedexeya çalakiyê sext û dijwar e.

Hukûmet hejmara cihên li Komvuxê kêm kiriye. Pişka ciwanên ku li xwendegeha bilind dixwînin kêm bûye. Gava pêwîstî bi cihên perwerdeyê hebe, cih pir kêm hene. Ev destbelayiya bi heyinên mirovî û hem jî bi heyinên aboriyê ye.

Em dixwazin pêşemîniyê bidin jêhatîbûn û kapasîteya ciwanan a li ser dewlemendiya hizrî. Loma divêt qedexeya çalakiyê ya li Daîreyên Karî ji holê bêne rakirin. ciwanên ku pêwîstiya wan bi pratîkê yan jî bi perwerdeyê hene, gerek e ne hewcedar bin ku belasebeb li bendê bêne hiştin. Em dixwazin li ser fîrmayan, xerca karkardêran ya dema kardayîna ji bo ciwanên bêkar kêmtir bikin, her wisa jî, ji bo 20 000 cihên pratîk û cihên perwerdeyê sermaye daynin.

ciwanên welatê Swêdê pêşeroja me tevan e. Loma divêt em li ser vê yekê haydar bin, ku baweriya wan bi pêşeroja wan neşikê.

- Divê sermaye li ser ciwanên ku hîna ji roja pêşî ya bêkariyê pêwîstiya wan heye, bi aktîfî bête razandin.
- Ji bo ciwanan 20 000 cihên pratîk û cihên perwerdeyê
- Li ser fîrmayan, xerca kardêran ya dema kardayîna ji bo ciwanên bêkar, kêmtir bikin.

GAVA KU GELEK KEŞ KOMEKÎYÊ BIKIN ALÎKARIYA SOSYALÊ JÎ KÊMTIR DIBE

Swêd welatekî bêhed xweş e, lê hin ewrên reş û tarî li ser Swêdê pêl vedidin. Îroj pileya bêkariyê cihê xwe zexm kiriye û alîkariya ji sosyalê li tevaya şaredariyên welêt, ji % 80yî derbas bûye.

Ji bo kesên têrdewlemend baca li ser çar yekê tevaya xelkê Swêdê hatiye daxistin. Xerca Kasaya Bêkariyê wisa giran bûye, ku êdî derfet nîn e, ku mirov bibe endam. Li ser vê jî sîgorteya nexweşiyê hatiye xirabtirkirin, ku nexweşên giran, nexweşên bi penceşêr, bêtemîn û bêsîgorte dimînin.

Ji hilbijartinên sala 2006an ta niha, hejmara li dervemayîna ji civatê, bi qasî 70 000 kesî zêde bûye. Ev çendî ku dirêj berdewam bike, ji bo xelkê ji navderketina vê rewşê jî, ew çend dijwar dibe. Vegerandina ser jiyaneke normal dijwartir dibe. Lê belê hikûmet her dîsan jî, li ser heman xetê berdewam dike.

Em dibêjin tiştekî xwezayî ye, ku kar û xebat berî her tiştî be. Me bawerî heye, ku gava piraniya xelkê kardar bin û bikaribin xewnên xwe rast bigerînin, hingê welatê Swêdê xurttir dibe. Niha hewildanên ji bo geşepêdanên bi zanetî gerek in. Em dixwazin baca li ser fîrmayên biçûk, bi 6 milyar kronan kêmtir bikin û jêdaxistina ROTê jî bilind bikin. Gelek xaniyên nû ava bikin û sermayerazandinan li ser avahiyên bingehîn ên nû bikin. Her bi vî awayî, xelk bêhtir dibin kardar. Em dixwazin ji bo peydakirina 100 000 karên nû û cihên pratîk û perwerdeyê sermaye razînin.

Em dixwazin hevgirtina civakî ya li Swêdê xurttir bikin. Divê sînorê jorîn ya di sîgorteya nexweşiyê de bête rakirin, ku nexweşên penceşêrê û nexweşên giran ên din, nekevin ber rîska bêsîgortemayînê. Ji ber vê jî, rehabîlîtasyon gerek e bêhtir bête lêanîn û ev bibe kesane. Em dixwazin vê guherîna ewleyî bikin, ku lêçûna ji bo mafê endametiya li sîgorteya bêkarmayînê bête daxistin: Gerek çi kesekî jî, ji bo endametiya Kasaya Bêkariyê ji ser 80 kronî bêhtir pere nede. Ji derveyî vê jî, em ê sînorê jorîn ya bihayê sîgorteyan bilind bikin, da ku gelek kes li hember windakirina hatina xwe, bibin xwedî stareyeke rastîn.

- Baca kêm li ser fîrmayên biçûk.
- 100 000 karên nû û cihên pratîk û perwerdeyê.
- Ji bo her kesî sîgorteya nexweşî û bêkarmayînê ya ewle.

JI HER KESÎ RE DI TÊRÛTIJÎBÛNÊ DE KALÎTE

Di sala dawîn de bi qasî 25 000 firsendên kar ji xwendegehan, ji sexbêriya nexweşiyê û guhpêdanê winda bûne. Ev dihêt wê maneyê, ku pir kes bêkar dimînin û kalîteya di têrûtijîbûnê xirabtir dibe. Li dibistanan baldariya li ser her şagirdekî kêmtir dibe û nexweş li odeyên payînê demeke dirêj li dora xwe dipên. Di heman demê de jî hikûmet, baca li ser kesên xwedîhatineke bilind jî kêmtir dike.

Fikra me tiştekî din e: Bi sermayerazandina li ser bêhtirkirina personelên li zarokxaneyan û xwendegehan, zarok bi awayekî baştir dest pê dikin. Dê hejmara zarokên li sefan kêmtir, lê belê hejmara mamosteyan bêhtir bibe. Em ê li sexbêriya nexweşan, bi riya bêhtirkirina hejmara personelan, dorên dirêj ên sexbêriya nexweşan kurttir bikin û kalîteya sexbêriyê bilindtir bikin. Bi peydakirina karên nû, ku em dertînin meydanê, gelek kes beşdarî civatê dibin û dibin xwedî berpirsiyariyê. Bi vê yekê re, em ê bibin xwedî têrûtijîbûneke hê baştir û dê derfeta gelek karên nûtir derkevin holê. Bi vî awayî em ê spîraleke erênî bidin destpêkirinê, ku dê pir kes bibin xwedî jiyaneke dewlemendtir.

Li zarokxaneyê hînbûna zarokan bi alîkariya lîstin û bihevrebûnê tête pêş xistin. Îroj zarokên ku xwedî dêbavên betaliya dêbavî ne, yan jî bêkar in, xwedî wî mafî ne, ku di hefteyekê de bi tenê 15 saetan li zarokxanê bin. Ev bisînorkirina demê, dibe sedem, ku dêbav mecbûr dimînin parçeyên demê li hevdû daynin. Ev yek ji bo gelek zarokên nabin xwedîderfet, ku tevî hevalên xwe beşdarî heman serpêhatiyan bibin, dibe xeyalşikestinek. Em dixwazin maf bidin hemû zarokan, ku di hefteyekê de 30 saet li zarokxaneyê bin.

Lê, civateke têrûtijî tête maneya azadiya hilbijartinê. Em dixwazin ku xelk bi xwe sexbêrvanên xwe hilbijêrin û zarok û dêbav xwe bi xwe dibistanê ji xwe re hilbijêrin. Lê belê ev ne rewa ye ku fîrmayên taybetî yên sexbêriyê nexweşên bêqezenc derkenar bikin, yan jî xwendegeh zarokên ku pêwîstîya wan bi komekiyeke zêde heye derkenar bikin.

- Li dibistanan sefên bêhtir û biçûktir.
- Dorên kurt ên sexbêriyê û kalîteyeke baştir di sexbêriya nexweşan de.
- 30 saet zarokxane ji bo zarokên xwedî dêbavên betaliya dêbavî û bêkar.

KÊMKIRINA QELÎŞTEKAN

Feqîriya zarokan bilindtir dibe. Pileya bêkarmayînê di asteke bilind a rekorê de ye. Yekî karkenar, ji yekî mûçegir bêhtir bacê dide. Baca milk ne dadmendane ye. Çareseriyên hikûmetê, ew prosent daye, ku mirovên herî dewlemend bi qasî hemû hebûnên ji çaryekê tevaya xelkê Swêdê ne. Qelîştekên di navbera xelkê de kûrtir dibe.

Em pê dizanin wekhevî û qelîştekên biçûk di navbera mirovan de, reçeteya serkeftinê ne. Loma karkenar û mûçegir dê wekhev bêne bac kirin. Pereyên karkenariyê mûçeya paşxiştî ye - ne sedeqe ye. Her weha, em dixwazin piştgiriya ji bo dêbavên ku bi tenê dimînin, bêne bilind kirin û hewla karpeydakirina ji bo ciwanan hewla pêşemîn be. Loma em dixwazin sînorê jorîn yê pereyên dêbavtiyê ya demî di wexta sexbêriya zarokên nexweş de, bête bilind kirin.

Û dê baca milk bi dadmendane bibe. Ew prosenta bi tenê ya xaniyan, ku nirxê milk ya backirinê ji ser 4,5 milyon kronan e, dê ji bihayê îroj bêhtir bête bac kirin. Ji bo wan 99 prosentên din jî, dê baca milk, yan her weke xwe bimîne, yan jî, gava ku me qaîdeya bi sînorkirinê ber bi pêşve bir, dê hingê ji pileya îroyîn hinekî kêmtir be.

Gava ku bêhtir kes bibin xwedî derfeta beşdarbûna avakirina civatê, dê hingê em ê bikaribin sermaya xwe li ser civateka têrûtijî û ya hê baştir razînin. Gava xwendege û sexbêriya nexweşan baştir be, dê hingê hê bêhtir kes beşdarî avakirina civatê bin. Bi vê riyê em spîraleke erênî peyda dikin, ku qezenca her kesekî di vê de heye.

- Baca karkenariyê rakin.
- Piştgiriya sexbêriyê û alîkariya xanî ji bo dêbavên bi tenê dimînin, bilind bikin.
- Sînorê jorîn yê pereyên demî ya dêbavtiyê bilind bikin.

SOR

Bêhtir cihê kar
Em dixwazin sermayeyê li ser 100 000 cihên kar, pratîk û perwerdeyê razînin. Em dixwazin xerca kardêran ya li ser fîrmayên biçûk kêm bikin. Em dixwazin xaniyan û jêrxanê nûjen bikin û gelek karkerên nû di civata têrûtijî de bixin ser kar.

Ji ciwanan re derfeta karê bêhtir
Ji bo ciwanên bêkar, ku hîna ji roja pêşîn muhtac in, çalakiyên aktîf bikin – qedexeya çalakiyê ya li Daîreyên Kar rakin! Ji bo ciwanên bêkar, cihê 20 000 pratîk- û perwerdeya nû ava bikin.

Pereyên karkenarbûnê û mûçe wekhev bac bikin
Karkenarbûn ne sedeqe ye, mûçeya paşxistî ye. Pereyên karkenariyê û mûçe, gerek e wekhev bêne bac kirin. Gava ku mirov kar bike û gava ku mirov kar kiribe gerek qezenceke mirov tê de hebe.

Dibistan û sexbêriyeke baş berî kêmkirina bacê têt.
Em dixwazin li ser karê civata têrûtijî sermaya xwe razînin û kalîteya sexbêriya nexweşan, guhpêdanê û dibistanê bilind bikin.

Azadiya hilbijartinê ji nexweşan re
Sexbêriya nexweşan gerek e tam bête bi kalîte kirin. Li sexbêriya nexweşan, şerîta qeymaxê qedexe bikin – sîgorteyên taybetî û xwedîperebûn, gerek e nekeve pêşiya mirovên hewcedar. Gerek e her kes, xwedî heman mafî be, ku bikaribe ji xwe re kîjan sexbêrvanî bixwaze, bikaribe hilbijêre, lê gerek e fîrmayên sexbêriyê nikaribin di nav nexweşan de hilbijartinekê bikin.

Sîgorteya nexweşiyê – beşek ji rêça xebatê
Em dixwazin sîgorteya nexweşiyê tamîr bikin. Gerek bi alîkariya mirovan rabin, da ku mirov ji xwe re bikaribin vegerin ser karê xwe û gava mirov nexweş bin, dîsan bikaribin xwedî ewletiyeke aborî bin. Sînorê jorîn têtе wê maneyê, ku nexweş bêsîgorte dimînin, loma gerek e sînorê jorîn ji holê bête rakirin.

ŞÎN

Qelîştekên bêhtirbûyî
Hikûmet soza peydakirina derfeta gelek karan da – Lê belê 100 000 kar ji nav civatê kêm kir. Hikûmet soza kêmkirina lidervemayîna ji civatê da – Lê belê 70 000 kes bêhtir li derveyî civatê man. Avakirina xaniyan û çalakiya sermayerazandinê hatiye rawestandin û hejmara cihên perwerdedayînê hatiye kêm kirin.

Gelek kes bi alîkariya sosyalê dest bi jiyana xwe ya navsere dikin
Bêkariya ciwanan ya li Swêdê, di nav welatên Yekîtiya Ewropî de, ya herî bilind e. Ji ber vê jî, gelek ciwanên ku pêwîstiya wan bi alîkariyê hene, gerek e herî kêm 3 mehan rawestin ta ku herin cihekî pratîkê yan jî perwerdeyê. Niha ji %30ê kesên ku alîkariya sosyalê werdigirin di bin salên 30î de ne.

Baca bilindtir ji karkenaran werdigirin, ne ji mûçewergiran
Hikûmet ragihandiye ku divê karkenar ji mûçegiran bêhtir bacê bidin.

Civata têrûtijî xirab dibe gava ku bac ji bo dewlemendan têt kêm kirin
Di civata têrûtijî de 25 000 cihê kar hatine winda kirin. Hikûmet berî her tiştî, nêzîkî 100 milyar kronî bac daxistiye – piranî jî, baca kesên herî dewlemend.

Şerîta qeymaxê li sexbêriyê
Hikûmet qanûnek derxistiye, ku fîrmayên sexbêriyê dikarin xwe li cihê ku qezenca herî bilind heye ragirin. Ne ku li cihê ku hewcedariya herî bilind heye. Nexweşên xwedî sîgorte dikarin bi pereyan ji xwe re dora xelkê bikirin.

Sîgorteya bi 10 000an kesî namîne
Hikûmet welê kir, ku bi 10 000an kes bê sîgorte man û ragihand, ku dê sînorê jorîn ya di sîgorteya nexweşiyê de li cihê xwe bimîne. Kesên nexweş gerek e ne hewce bin herin alîkariya sosyalê werbigirin. Gelo mirov çawa dikare tendurust be heger gava ku meriv feqîrtir be?

SERMAYERAZANDINA LI SER JÎNGEHÊ BI QEZENC E

Erkeke dijwar e ku mirov bikaribe berê civatê bide ser riyeke hê ewletir. Lê belê ev di heman demê de jî, deranîna derfetekê ye, heger mirov bikaribe ji bo jîngehê û ji bo peydakirina gelek karan xwedîderfet be. Em dixwazin Swêd di warê enerjiya xwetazeker de, di warê lêkolînên zanistî û avakirina xaniyên îqlîmjîr de, bibe xwedî cihekî pêşeng. Jêdaxistina ROTê ya îroyîn gerek e bi bonûseke serzêde ya îklîmê, ji bo rêzexaniyan, vîllayan, daîreyên kesane û komeleyên ji bo xaniyên kesane, bête berfireh kirin. Em dixwazin ji bo xaniyên pirmalbatî yên bi profîlên îklîmî, destega ji bo jêderxistina ROTê ya nû bi kar bînin.

Dê ji bo mirov û fîrmayan hêsantir be ku ji xwe re bikaribin kîjan rêya guhestinê bixwazin, wê hilbijêrin, loma ye ku ji bo riyên hesinî û trafîka kollektîf sermayerazandineke mazin a dîrokî gerek e. Ev yek hêza reqabet û hevrikiya Swêdê xurttir dike.

Bikaranîna bi zanetî ya çavkaniyên bacê, ji bo xweguherandina bi tesîr ya li gor îqlîmê dibe alîkar. Me pêwîstî bi navgînên birêvebirinê heye, da ku em Swêdê zûtir bixin ser rêya guherînê. Loma em di vê derbareyê de, ji bo erka dema li pêş, bersivên zelal didin. Loma em vekirî û durust dibêjin, dibe ku pêwîstî hebe baca karbondîoksîdê bête bilind kirin. Di serdema erka li pêşiya me de, dê bihayê benzînê bi gîştî bi 49 Öreyan bête bilind kirin. Lê belê ji bo kesên, ku ji bo çûna bo karê xwe pêwîstî bi otomobîlê hene, tam telafî jî tête kirin. Di nav van çar salên pêşîn de, jêderxistina sefera çûnûhatina bo kar, ji bo deh kîlometreyan bi gîştî bi 1.50 Kron tête bilind kirin.

Hikûmet newêre bibêje ku ew dixwazin baca benzînê çiqasî bilind bikin. Gelo dê bibe 70 Öre wek encumena îqlîmê ya bloka bûrjûwayan pêşniyar kiribû? Yan jî dê wek Centerpartiet'ê pêşniyar kiribû, bi 105 Öreyan bilindtir bikin?

Backirina wasiteyan gerek e bi şêweyekê ji nû ve bête danîn, ku ji bo rêvebirina karûbarên parastina jîngehê bibe xwedîtesîr. Em dixwazin baca wasiteyan ji bo otobusan bi 100 milyon Kronî kêm bikin. Em dixwazin karûbarên guhertina ji bo wasiteyên giran bi piştgiriyeke demî hêsantir bikin. Her wisa jî em pêşniyara piştgiriyeke ji bo paşguhertinên otomobîlên kesane dikin, ku gelek kes bikaribin jîngehdostane biajon.

- Jêdaxistina ROTê bi bonûseke zêde ya îqlîmê berfireh bikin û ROT ji bo pirmalên malbatî jî bi kar bihênin.
- Sermayerazandineke mezin a dîrokî ji bo riyên hesinî û trafîka kollektîfî.
- Hêsanîkirina ji bo wasiteyên hem giran û hem jî sivik ku ew bi awayekî jîngehdostane biajon.

PERWERDE BÊHTIR KAR DIAFIRÎNE

Îroj li Swêdê bêhed pir kes hene ku karekî wan tune ye ku herinê. Ji ber vê jî, fîrma hene ku dixwazin xelkê bigirin kar, Lê belê nikanin kesê xwedî kompetensa pêdivî bibînin. Dîsan jî hikûmet ji xwe re diyar kiriye, ku perwerdeya ji bo mezinan ya Komvuxê û perwerdeyên bazara karî bide rawestandin û herweha bernameya avakirina xwendegeha bilind daye rawestandin. Çareyên ku dikaribû pirsgirêkê hel bike.

Zanyarî û zanebûn, rê ji pêşketin û serbestiyê re vedike û her wisa jî derfeta azadiyê dide. Pêwîstiya Swêdê bi hêzeke xebatê ya têrzane û guherbar heye. Ji ber vê yekê ye em dixwazin sermayeyê bi awayekî berfireh li ser cihên pratîk û perwerdeyê razînin. Gava ku xelk hêsaniya karguhertinê dibînin, hingê gelek kes dikarin mercên kompetensî yên bazara karî bînin cih. Ev pêwîstiyek e, ne ku hema ji holê rakirina rewşa bêkariyê ye, ji ber ku ev çareserkirina pirsa hêza hevrikî ya pêşerojê ya Swêdê ye.

Gava ku fîrma dihên girtin û karûbar diçe derveyî welêt, hingê pir girîng e, ku xelk bikaribe bibe xwedî derfet, ku xwe perwerde bike yan jî xwe fêrî pîşeyeke nû bike. Swêd divêt bikaribe hevrikiyê bi zanyariyê re bike – ne ku mûçe bêne kêm kirin. Em dixwazin sîgorteyeke kompetensê ava bikin, ku ew derfetekê bide xelkê, da ku di jiyana xwe ya kar de bikaribin xwe fêrî pîşeyeke din bikin.

- Di xwendegeha bilind, xwendegeha bilind a pîşeyî, xwendegeha ji bo mezinan û li perwerdeya bazara karî de gelek cihên nû.
- Sîgorteyeke karî ya ji bo kompetensê ava bike.
- Divê Swêd reqabetê bi zanyariyê re bike ne ku mûçeyan kêm bike.

HELBET WEKHEVÎ

Pêşketin ber bi paş ve dihere. Hema ji hilbijartina sala 2006an bi vir de ye, ku bac, ji jinan bêhtir ji bo mêran li ser %30î hatiye daxistin. Xerabtirbûna sîgorteyên ewletiyê, her wisa jî sîgorteya nexweşiyê li ser gelek jinan pir giran rûniştiye. Ji mêran pirtir, gelek jin bi aboriyeke xirab û bi encama hatineke xirab a dema karkenariyê, rojê nîvdan dixebitin. Gelek jin ji karê xwe yê sexbêriyê, xwendegehê, hatine derxistin û hîna gelek jinên din, dê ji ber kêmkirina alîkariya dewletê, ji karên xwe bêne derxistin. Dîsan jî, hikûmet alîkariyeke sexbêriyê daniye, ku tam li hember wekheviyê dixebite û herwisa jî, pere ji zarokxaneyan dikişîne.

Jin û mêr divêt bibin xwedî heman hêzê, ku hem jiyana xwe û hem jî civata xwe bi rêk û pêk bikin. Divêt Swêd di qada navneteweyî de her berdewam be û bibe nimûneyeke berçav ya pirsên wekheviyê. Loma divêt hem jin û hem jî mêr ji bo kar û kariyera xwe bibin xwedî heman derfetê. Gelek jin dixwazin bibin xwedî karên tamrojî, lê kes derfetê nade wan. Ji bo bêhtirkirina wekheviyê girîng e, ku mafê tamrojî kar kirin bête xurt kirin. Beşek mezin ji xebata ji bo têrûtijîbûna civakî, li dor kardayînên nîvdanî hatine bi rêk xistin. Sektora giştî, divêt berî her kesî, here û nîşan bide ku karê tamrojî dikare bibe rastî. Em dixwazin li Şaredarî û Meclîsa Wîlayetê, milyarek Kron sermaye razînin, da ku em ji bo peydakirina karên tamrojî bêhtir xîretê bikin.

Rêça xebateke fonksîyonel merc dibîne, ku divê hem jin û hem jî mêr bikaribin bixebitin – bêyî ku mirov hevjîn be, yan jî dêbavên tenêmayî be, hingê sexbêriya zarokan hem ya êvaran û hem jî di tehtîlan de gerek e. Em dixwazin di dema xebata nerehet de jî, derfetê bidin dêbavan da ku em bikaribin hem jiyana dêbavtiyê û hem jî jiyana xebatê bikin yek.

Divê zarokxaneyeke bi kalîteya rind ava be da ku zarok li wir dilxweş bin û dêbav pê xwe ewle hîs bikin. Ev yek ji bo civateke wekhev merca bingehîn e. Mixabin ku pêşketin ber bi hêleke nebaş ve diçe: Hejmara zarokan ya di koman de bêhtir û hejmara personelan jî kêm dibin. Em dixwazin bi rêya sermayerazandina li ser personelên di civata têrûtijî de û kalîteyê di zarokxaneyan de bi ewle kin.

- 1 milyar Kronên din ji bo peydakirina karên tamrojî li gelek şaredarî û meclîsên wîlayetê.
- Sexbêriya zarokan di demên kar ên nerehet de.
- Sermayerazandina li ser kalîteya di zarokxaneyê de.

TU JÎ KAREKÎ BIKE

Ne gerek e tu bibî endam yan jî pîsporekî siyasî bî, ku tu paşê bikaribî tevî karekî bibî. Yê girîng ew e, ku tu karekî bikî – biçûk yan mazin. Telefon bike, li cihê kar belavokan belav bike, rewşa Facebooka xwe biguherîne, di rojnameyekê de nivîsarekê binivîse, bi hilbijêran re bipeyive yan jî li çend deriyan bixe.

HER YEKSER BIBE ENDAM!

Personnummera xwe bi SMSê binivîse û ji vê jimareyê re bişîne 72105, bihayê vê 100 kr e.

möjligheternasland.se